



23 Nîsan- 2019an

Mijar: Rewşa Mafên Mirovan li Colana Sûrîyayî ya Dagîrkirî

Dugelên Yekbûyî yên Amerîkayê roja dûşemê, 25ê adara 2019an, bi serwerîya Îsraîlê li ser Colana Sûrîyayî ya Dagîrkirî ji sala 1967an, îtîraf kir û ev yek li dijî biryarên Encumena Ewlekarîyê 242 - 497 bû û ev yek nîşaneke metirsîdar e ku bînpêkirinên bi rêbaz ji bo mafên mirovan diçesipîne û rewatiyê dide şerê leşkerî yên ku bi xwe bînpêkirineke eşkere ne bo qanûna navdewletî ku koçberî, wêran û destdanîna ser milk û malan jê re bûye encam.

tevî ku biryara DYAyê rewşa qanûnî ya Colanê weke xakeke dagîrkirî ji hêla Îsraîlê ve naguhêre, lê gefeke eşkere li pêşeroja Sûrîyayê û Rojhilata Navîn dixwe û rastîya Amerîka li herêmê weke navbeynkarekî avakirina aştiyê li herêmê dike cihê gumanê, ji lew re pêdivî bi lêvegereke pêvajoya aştiyê heye ku hevkar tê de bêalî bin.

Em rêxistin, tevger û destpêşxerîyên sîvil yên jêrîmzeker, ji hêz û dewletên ku piştgirîya aştiyê û mafên mirovan li Sûrîyayê dikin dixwazin li dijî normalîzekirina encamên cengê li Sûrîyayê û herêmê bisekirin û helwestên fermî nîşan bidin ku redkirina hemû rengên dagîrkerîyê tê de teqez be û xebatên pratîk ji bo berevaniya di ber welatîyên Sûrîyayî de werin kirin, nemaze bo welatîyên Colanê yên ku ji 1967an de li welatê xwe koçber in.

Îsraîlê êrîşeke hovane di 1967an de anî ser Sûrîyayê û dest danî ser Colanê û 130 hezar kes hatin koçberkirin yan jî 95% ji welatîyên wê û 240 gund hatin wêrankirin, tevî ku Neteweyên Yekbûyî ev dagîrkerî û encamên wê red kir lê Îsraîl di bînpêkirina Qanûna Navdewletî de li Colanê berdewam e û ji hemû alîyên şer li Sûrîyayê teqez dike ku bînpêkirinên metirsîdar ji bo qanûna navdewletî pêkan in û belgeameya neteweyên yekbûyî paşguh dike.

Îroj, ceng Sûrîyayîyan bêwar dike û sînoran dixwe nav wan û bajar û gundên wan, rola lihevkerinan mezintir dibe der barê çarenûsa dewletê de û herêmê dagîrkirî berfireh dibin ku bi rêya tank û topan û endezyariya demografîk tê dagîrkirin.

Em weke rêxistin pêşwazîyê li biryara Encumena Ewlekarîyê ya dawî (A/HRC/40/L.4) ku di 22yê adara 2019an de derketiye dikin her weha ji bo xebata bi kesên ku piştgirîya vê xebatê dikin û bawerîyê bi demokrasîyê û mafên mirovan dikin, amade ne, da ku di encamê de em berevaniyê di ber mafên mirovan de li Sûrîyayê bikin. Em bitirs in ku gef, bi rêya vê biryarê, li pêşeroja ewlekarî,

aştî û mafên mirovan were xwarin û çanda bêcezakirin were çesipandin, ji lew re pêdivî bi helwesteke navdewletî heye.

Ewlehî nabe behane bo tevlêkirina xakekê û bînpêkirina belgenameyên navdewletî û paşguhkirina mafên milletên resen, nebûna hikûmeteke rewa nûnertîya welatîyên sîvîl dike, nabe bibe sedema guherîna herêmekê ji ber ku tenê tundî û bêcezakirin encama wê ye.

Em rêxistinên jêrîmzeker doza pabendîyeke navdewletî ya zelal dikin ji bo parastina mafên Sûrîyayîyan li welatê wan û redkirina hemû hewldanên normalîzekirina encamên cengê û peydakirina navbeynkarên navdewletî yê bêalî û zelal ku karibin aştîyê li Sûrîyayê bi cih bînin.

Em li hêvîya piştgirîya we ne

Rêxistinên Îmzeker:

1. Alkawkabi Organization For Human Rights
2. Arab human rights Centre in Golan - Al-Marsad
3. Basmeh & Zeitooneh
4. Baytna Syria
5. Caesar Families Association
6. Dawlaty
7. Freie Deutsch Syrische Gesellschaft e.V in Hamburg
8. Kawakby Center for Transitional Justice & Human Rights
9. Kesh Malek Organization
10. Khatawat Foundation
11. Msawat/Equality Organisation
12. No Photo Zone
13. Pro-Justice
14. Syrian Center for Media and Freedom of Expression
15. Syrian Center for Statistics and Research
16. Syrian Feminist Lobby
17. Syrian Lawyers
18. Syrian League for Human Rights and Accountability
19. Syrian Legal Network - Netherlands
20. Syrian Network for Human Rights
21. The Syria Campaign
22. Union of Syrian Coordinations Around the World
23. Urnamu for Justice and Human Rights
24. Violation Documentation Center
25. Watan Foundation
26. Women Now For Development (WND)